

Lehî- metirsiya heywan û kêzikan

Zanyariyên li ser çawan bi heywan û kêzikan re piştî lehiyê tevbigerin

Kurdish Kurmanji | Kurdî Kurmancî

OFFICIAL

Wexta ku vedigerin devereke lehî lê rabûye, dibe ku ajalên hov, di nav wan de mişk, mar an pîrhevok, li mal, xanî yan baxçeyê we de asê mabin.

Bi maran re tevgeriyan

- Wexta ku li derve ne:
 - ✓ ji bo parastina lingên xwe pêlavên stûr, lepik û pantorên dirêj li xwe bikin
 - ✓ wexta paqijkirina piştî lehiyê pir li dest û lingên xwe miqate bin
 - ✓ eger hûn marekî bibînin, bi paş de biçin û bihêlin ew riya xwe bidomîne - dest an pêyê xwe nedin wî
 - ✓ haya we ji marên ku di nava avê de avjenî dikin hebe
 - ✓ divê hûn bermayiyên ji derdora mala xwe derxînin ji ber ku ew dikarin mar, pîrhevok û mişkan ber bi xwe ve bikişînin.
- Eger hûn marekî di mala xwe de bibînin, netirsîn, hêdî jê paşvegerin û bihêlin ku ew riya xwe bidomîne. Dest an pêyê nedin wî. Bo lîsteya margirên ku li herêma we, ji Wezareta Jîngeh, Erd, Av û Plansaziyê re bi 136 186 telefon bikin.
- Eger marek li we bide:
 - ✓ çermê dora cihê lêdanê neşon
 - ✓ bêliv bimînin û bi telefona 000 alîkariya bijîşkî ya lezgîn wergirin
 - ✓ wisan razên yan rûnin ku cihê lêdanê jêrî asta dilê we be.
 - ✓ şûna lêdanê bi perçeyê paqij û ziwa dapoşînin. Eger hebe, pêçandina qahîm a dora cihê lêdanê jî tewsiye dikin.
 - ✓ bala xwe bidin dema lêdanê û kingê hatiye pêçandin
 - ✓ şidandokê bi kar neyînin, şûna lêdanê qut bikin bila jehr derkeve yan hewl bidin jehrê ji birîne bimijin.

Bi pîrhevokan re tevgeriyan

- Eger pîrhevokek li we bide:
 - ✓ cihê lêdanê bişon û bo arîkariyê bidin kêmkirina êşê qeşayê dayînin ser
 - ✓ zextê neyînin ser
 - ✓ eger pîrhevokeke piştî li we bide yan jî eger nîşaneyên we xirabtir bibin demildest alîkariya bijîşkî bixwazin.

Bi mişk û kêzikan re tevgeriyan

- Mişkên wek mişkê malê û mişkê çolê nexweşiyên tînin. Divê hûn xwarin û tiştên din ku dikarin sitargehekê ji mişkan re çêbike rakin.
- Ji çopê xilas bibin û qapaxekî dayînin ser çopdankê. Eger pêwîst bike dehfikên mişkan li deverên ziwa dayînin.
- Ji ber ku vizik di ava rawestyayî de çêdibin jê dûr bimînin. Bi qasî ku mimkin be bedena xwe dapoşin û mêşparêzan bi kar bînin.
- Mêş nexweşiyên tînin. Bermayiyên xwarinê demildest paqij bikin ji ber ku ew cihek bo mêşan e.
- Eger heywanek we gez yan birîndar bike yan jî kêzik bi stûyê we ve vene, ji bijîşkê xwe şêwir wergirin an jî 7 rojên heftê 24 saetên şev û rojê, bi 1300 60 60 24 ji NURSE-ON-CALL re telefon bikin.

Bo wergirtina vê belavokê bi formatê guncaw, emailê bişînin pph.communications@health.vic.gov.au

